HELBEST DI ÇAXÊ NÛ DE



Evîn Mihemed Ebdilrehman

Teknolojiya nû rolekî giring di berhevkirina biyavê belavkirina helbestê de digêre, ew jî bi rêka têkiliyên bi lez di nav hemû cîhanê de, çi bi rêka kenalên asmanî, yan jî bi rêka tora intirnêtê, ku di şiyan de ye hejmareka here mezina mirovan ji xwandevanên helbestê hay ji wan pêşveçûnan yên bi helbestê de dihên, heta ku şiyan daye bîr û boçûn jî di navbera wan de bihên lêkguherîn.

Niha em dibînin ku gelek rojname û kovarên elektronî di tora internêtê de giringiyê bi helbestê didin, her çend dibêjin ku piraniya wan ne di astê pêdivî de bin û helbesteka bi raman xwe

HELBEST

ya temam pitiriya caran di wan malperan de nehêne belavkirin, belku pitir parçe pexşan û deqên edebî yên ne naskirî bin, ew jî bi van egeran dizivre:

1-Pitiriya mirovan mijûlî karên rojane ne û demê pêdivî bo xwîndin û têkilên edebî û wêjeyî nîne. Belku niho çaxê leziyê ye û teknolojiya nû, cihekî mezin di jiyana xelkê de girtiye, lewra hindek peyvên serpê dinivîse û di malperê de belav bike li jêr navê helbestê.

2-Niho xelk pitir hez dikin mijarên kurt bixwînin ku pitir hez dikin babetek bi nêzîkî hest û sozên wî be pitir ji hindê ku gaziyek bo jîrî û hejî be. Niha û bi taybet genc xwe nêzîk mijarên romansî û endîşey û girêday sozdariyê dibe pitir ji babetên jiyatî û nişтimanperweriyê, dibe kartêkirin jî ji rewet ragehandina derve û berxweşkên biyavî derveyî bin. Ev egerê dawiyê jî berpirseka mezin diêxe stûyê ragehandina navxweyî û nişтîmanî, ew jî berpirsiyariya hişyariya netewî û guhdana bername û programên fêrkirin û perwerdeyî bin ku merem jê hişyariya xwendevanan be li ser dîrok û hunokeyî û paşeroja welatî bibe. Ka çi pêdiviye ji bo vî welatî û şaristaniya wê bihête kirin û bernamên lêguherîna bîr û boçûnên rewşenbîrî bihête danan di navbera bajêr û bajêran de û her wesa di navbera welat û welatan de.

3-Ragehandina niha pitir giringiya bi mijar û babetên xweşiyê û girêdayî rewş û kawdanên siyasî yên henukey bin, di pişt ra jî hidek babet mijarên din

HELBEST

yê rewşenbîrî û civakî dihêne piştguhavêtin, ji ber hindê dibînin helbest ber bi lawaziyê diçe û pitir ber bi pexşanê û deqên kurt xwe xurt dike, di şiyan de ye mijara helbest li ser du astan bihêt baskirin, ew jî yên kesayetî û civakî. Dibe babetê helbestê girêdayî rewşa helbestvanî be, ku dibe di rewşeka bextewar de be, yan jî xemgîn be, serkevtî be yan jî dakevtinên wî di jiyanê de hebin, ev rewşeka kartêkirinê li ser helbesta wî dikin. Li ser astê civakî jî mijara helbestê bi kawdanên siyasî û aborî yên welat daxbar bibe. Bo nimûne mijarên helbesta kurdî di çaxên borî de girêdayî netewe û nîştimanperwerî û nû germiyek ji bo şoreş û serhildanan hebû. Lê li gel arambûna deverên Kurdistanê, helbest jî ber bi semteka din çû, ya pitir bûye helbesteka romansî û sozdarî. Bo nimûne rengên di nav helbesta nû de nahên diyarkirin.

Bêguman helbestî rolekê giring heye bi taybet di berçavkirina kêşe û dozên netewî de. Lê helbesta niha rewşeka kesayetî berçav dike ku girêdayî xem û kovan û bextewerên wî bi tenê be. Dihê dîtin ku niha helbestê lawazî di biyavê pesna sirûştê ciwanê Kurdistanê de heye, ser hindê ra ku hestên mirovayetî yên nazik û bêgunehan bi xwe ve digre.

HELBEST